

Daxûyaniya li ser parastina dane û zanyariyan û nihênîbûna tam a zanyariyên te

Lêkolîna „ReGES - Refugees in the German Educational System“ bi awayekî hevpar ji aliyê sê enstîtûyan ve tê birêvebirin.

- Leibniz-Institut für Bildungsverläufe e.V. (LifBi) li Bamberg
- infas Institut für angewandte Sozialwissenschaft GmbH li Bonnê û
- Institut für Arbeitsmarkt- und Berufsforschung (IAB), li Nürnbergê

Ev enstîtû li ser esasê qanûn û rêbazên parastina zanyarî û daneyan dixebitin.

Parastina zanyariyan bi vê wateyê ye:

- Beşdariya te di Rapirsînê de bi awayê xwebexş e! Eger tu nexwzî têda beşdar bibî, tu zirar û ziyar nagihin te.
- Tevahiya zanyarî û daneyên wergirtî ji te tenê ji bo armancên zanistî dê werin bikaranîn.
- Encamên zanistî yê wergirtî ji xebata li ser dane û zanyariyên te dê bi awayê nenas bînerkerin. Tu kesek niakre ji ser encama pê bihese kanê kîjan dane û zanyarî girêdayî bi kî/ê ne.
- Zanyariyên ku pê naseya te nîşan bidin, dê bi ti awayî ji aliyê me ve nekevin ber destê enstîtûyên din. Her wiha em bi ti awayî van zanyariyan û daneyan nadeyin ber destê rêxistinên dewletê li Almaniya yan derveyî welêt.

Ev kesên ku navên wan li dû tê, berpîrsên berçavgirtina qanûn û rêbazên parastina zanyariyan li van sê enstîtûyan ne:

Brigitte Bogensperger

Nûnera parastina zanyariyan
Leibniz-Institut für Bildungsverläufe

Christian Dickmann

Nûnerê parastina zanyariyan
infas Institut für angewandte
Sozialwissenschaft GmbH

Dana Müller

Rêvebira navenda zanyariyên lêkolînê
Institut für Arbeitsmarkt- und
Berufsforschung (IAB) Nürnberg

Li rûpela paş vê daxûyaniyê em rêya meşandî û derbasbûyî ji bo zanyarî û daneyên te ji dema hevpeyivînê heta raberkirina xişteya encamên tam nenas nîşanî te didin.

Leibniz-Institut für Bildungsverläufe e.V.
Direktorin: Prof. Dr. Sandra Buchholz

Wilhelmsplatz 3
96047 Bamberg

infas

infas Institut für angewandte
Sozialwissenschaft GmbH

Postfach 240101
53154 Bonn
kostenfreie Tel. 0800/66 47 436
reges@infas.de
www.reges-studie.de

Institut für Arbeitsmarkt-
und Berufsforschung
Die Forschungseinrichtung der
Bundesagentur für Arbeit



Institut für Arbeitsmarkt- und
Berufsforschung (IAB)
Regensburger Straße 104
90478 Nürnberg
www.iab.de

GEFÖRDERT VOM



Bundesministerium
für Bildung
und Forschung

Dê çi were serê zanyariyên te?

- 1 Pêkênerên hevpeyvînê yên me zanyarî û daneyên wergirtî ji te ji rêya Rapirsînê derbasî nav Kampiyûtîerî dikin.
- 2 Zanyariyên bidesthatî yên te bi rêya hevpeyvînê tenê bi jmareka kodê tên tomarkirin û ji nav û navnîşana te cuda ne.
- 3 Nav û navnîşan tenê bo sê enstîtûyan tê raberkirin: LîfBi, infas û IAB. Nav û navnîşan hertim bi tamî ji ser bersivên te tên jêbirin û veqetandin. Ev sê enstîtû tenê heta dema dawiya Rapirsînê nav û navnîşanan li ba xwe dihêlin. Piştra nav û navnîşanên hemî beşdarên tên rakirin û jêbirin.
- 4 Tevahiya pirsan bêyî nav û navnîşanê tên nixandî. Wek mînak Kampiyûtîer tevahiya bersivên bo pirsê li ser Dibistanê di hejmêre û rêjeya sedî ya encaman hesab dike.
- 5 Encama giştî û encamên binkoman (Wek mînak Mêran û Jinan) bi awayê xişteyî anku cedwelf tên çapkirin. Zanyariyên yek bi yekê beşdarên li xişteya encaman nikarin bî naskirin.
- 6 Eger zanyariyên nû bî berhevkerin, nav û navnîşana te her tim ji Bersivê tê cudakirin.

Mînak:

Tu li ku çûyî dibistanê?

- Tenê li Almaniyayê 1
Tenê li welatekî din 2
Li Almaniyayê û li welatekî din 3

	Giştî	Mêr	Jin
Tenê li Almaniyayê	26%	33%	15%
Tenê li welatekî din	64%	57%	75%
Li Almaniyayê û li welatekî din	10%	10%	10%
Rêjeya giştî ji sedî	100%	100%	100%

Bi her hal ev tişt misogir e:

Beşdarbûna te li hevpeyvînê û raberkirina zanyariyan xwebexş e.

Helbete tu dikarî beşdariyê bikî, lê bersiva hin pirsan nedî. Tu dikarî razîbûna xwe ya bona beşdarbûna li vê planê di her demekê da û bêyî tu sedemekê û bêyî hebûna dûhatên wê li infas-Institutê betal bikî. Tu dikarî zanyariyên têkillîgirtinê yên infasê li ser rûpela rû ya vê daxûyaniyê peyda bikî. Beşdarnebûna te wê ti dûhatan neyne. Hemî rêbaz û qanûnên parastina zanyariyan tên berçavgirtin. Heke bixwazî, infas-Institutê navnîşana heyî dide ber destê te û heke bixwazî wê diguherîne. Em her wiha amaje bi mafê gîlîkirinê li Rêvebiriya Çavdêriyê li ser esasa xala 13 ya qanûnên parastina zanyariyan ya Ewropayê dikin.

Tu dikarî tam dilniya û piştrast bî ku em ...

- Nav û navnîşana te digel bersivan girênadin, da ku ti kesek bi bersivên te nehese;
- Nav û navnîşana te nadin ber destê kesek an aliyek sêyem;
- Em tu cûre zanyariyên kesane ku têkilliya xwe bi te ra heye, nadin ber destê aliyekî sêyem;
- Ev dane û zanyarî tenê jibo armancên zanistî tên bikaranîn.

Em ji ber hevkarî û pêbawerîya te bi karê me, sipasiya te dikin!